

PAPER DETAILS

TITLE: 'Eqîdeyêñ Menzûm Di Edebiyata Kurdî De

AUTHORS: Nusrettin BOLELLI,Nurettin ERTEKIN

PAGES: 29-49

ORIGINAL PDF URL: <https://dergipark.org.tr/tr/download/article-file/400776>

'EQÎDEYÊN MENZÛM DI EDEBIYATA KURDÎ DE

Poetic Aqidnames In Classical Kurdish Literature Klasik Kürd Edebiyatında Manzum Akaidler

Nusrettin BOLELLİ¹ - Nurettin ERTEKİN²

KURTE

Piştî qebûlkirina dînê Îslamê gelên Musulman ji bo bîr û baweriyêن dînê Îslamê berhem afirandine. Gelê kurd jî, weke hemû gelên Musulman ji bo perwerdehiyâ bîr û baweriyêن dînê Îslamê berhem anîne holê. Ev berhemêن ku mijara wan bîr û baweriyêن Îslamê ne û bi navê 'Eqâidê têن nasîn hin ji wan bi pexş/nesr û hin ji wan jî bi nezm amade bûne.

Di edebiyata gelên rojhilatanavîn de çawa 'eqîdeyêن menzûm wek cûreyek ji berhemêن edebî hatine nasîn û di medreseyan de perwerdehî bi wan hatiye kirin her wiha edebiyata Kurdî jî ku perçeyek ji edebiyata rojhilata navîn e, ji berhemêن edebî yên bi vî cûreyî bêpar nemaye û ji bo perwerdehiyê, xasma perwerdehiya zarokêن Kurdan gelek 'eqîdeyêن menzûm' di xwe de bi cih kiriye.

Ev nivîs armanc dike ku eqîdeyêن menzûm ên di edebiyata Kurdî ya klasîk de hatine nivîsîn, bide nasîn. 'Eqîdeyêن menzûm, hêjmara beş, beyt û taybetîyêن wan bi qasî agahiyêن ku me bi dest xistine di vê gotarê de bi cih bûne.

Bêjeyêن Sereke: 'Eqîdeyêن Menzûm, Edebiyata Kurdî ya Klasîk, 'Eqîdeyêن Menzûm ên Edebiyata Kurdî ya Klasîk.

1 Doç. Dr., Mamosteyê Beşa 'Erebî, Zanîngeha Bîngolê.

2 Xwendekarê Lisansa Bilind a Bi Tez.

ÖZET

İslam dininin kabulünden sonra Müslüman halklar İslam inancı için kitaplar yazmışlar. Kürd halkı da bütün müslüman halklar gibi İslam inanç esasları için kitaplar meydana getirmiştir. Konusu İslam inancı ve esasları olan kitaplar ‘Akaid’ kitapları olarak tanınmakta, bunlardan bazıları manzum bazıları da düz yazı şeklinde hazırlanmışlardır.

Nasıl ki Ortadoğu halklarının edebiyatında manzum akideler bir edebi kitap türü olarak tanınmış ve medreselerde kitap bir eğitim ya da öğretim materyiali olmuşsa, aynı şekilde ortadoğu edebiyatının bir parçası olan kurd edebiyatı da bu edebî türden kendini mahrum bırakmamış, özellikle kurd çocukların eğitimi için birçok manzum akaid kitaplarını kendi içinde barındırılmıştır.

Bu yazında elde ettiğimiz bilgiler çerçevesinde manzum akaidler, bölüm sayıları, beyit sayıları ve özelliklerine göre sınıflandırılmıştır.

Anahtar Kelimeler: Manzum Akaidler, Klasik Kürd Edebiyatı, Klasik Kürd Edebiyatında Manzum Akaidler.

ABSTRACT

After accepting the Islamic religion, Muslim peoples wrote books for Islamic beliefs. The Kurdish people, like all Muslim peoples, have brought books for Islamic beliefs. The books on Islamic belief and principles are known as ‘Akaid’ books, some of which are poetry and others are written in plain text.

In the same way, Kurdish literature, which is a part of Middle Eastern literature, has not deprived itself of this type of literary book, and has been able to publish many verse akaid books for its education and especially for the education of Kurdish children, as it is known as a kind of literary book in the literature of the peoples of the Middle East, harbored.

In this article, poetical poets in classical Kurdish literature are introduced. In this article, we have covered the information on the vernacular akaideleler, chapter numbers, couplet numbers and properties.

Keywords: Manzum Akaidler, Classical Kurdish Literature, Manzum Akaidler in Classical Kurdish Literature.

DESTPÊK

Bêjeya ‘Eqâidê ji ‘erebî hatiye û ji rayeka **a k d** (أَكَاد) ê peydabûye. ‘Eqâid, pirhejmara “ ‘Eqîde” yê ye û wateya wê a bêjeyî girêklêxistin’ e. Bêjeya ‘Îtîqad’ê bi wateya ‘girêdana tiştekî bi girêklêxistinê, baweriya tiştekî bi dil û can, bi dil hebandin’ê té.³

3 Ahmet Saim Kılavuz, “*Akaid*”, DİA, II, 212.1989

Li gorî wateya têginî;

- a- Rêgezên ku pêwist e baweriya bi wan hebe
- b- Zanistên ku mijara wan rêgezên baweriyêne mecbûrî ne
- c- Doktrînên baweriyê
- d- Berhemênu ku mijara wan rê û rêbazên baweriyêne, ji wan re 'eqîde tê gotin.⁴

Bi wateya taybetî; zanista ku bi kurtasî û bê nîqaş mijarêne bîr û baweriyêne dinê İslâmî tîne zimêne 'eqâid e.⁵ Li gor vê pênaseyê mijarêne 'eqâidê yên sereke ev in.

- a- Baweriya bi Xwedê
- b- Baweriya bi firêşteya/ferîşteyan
- c- Baweriya bi pirtûkan
- d- Baweriya bi pêxemberan
- e- Baweriya bi axretê
- f- Baweriya bi qederê⁶

Nivîsandina berhemêne 'eqâidê di lîteratura İslâmî de cihêkî girîng digre. Ji ber sedemêne derketina hin pisgirêkên bîr û baweriyêne, zanyarêne İslâmî berhemêne 'eqâidê nivîsandine. Di dîroka İslâmî de cara yekem Ebû Henîfe berhemêne 'eqâidê nivîsandiye. *El-Fiqhu'l-ekber*, *el-Fiqhu'l-ebsat*, *el-Âlim ve'l-muteallim* û *el-Wasiyye* çar berhemêne Ebû Henîfe ne di mijara 'eqîdê de. Wek Ebû Henîfe; 'alîm û zanayêne mîna Îmam Şâfiî, Ahmed b. Hanbel, Taberî, Tahawî, Buhârî, Dârimî, Ebû Davud û Îbn Mende jî berhemêne 'eqâidê nivîsandene.⁷

'Alîmên İslâmî mijarêne zanista 'eqîdî ewqas girîng dîtine ku ji bo jin û pîrekên muslimanan berhemêne taybet nivîsandine. *El-Însaffî ma Yecîbû l-tîqaduhû we la Yecîzu'l-Cehlû Bîhî ya Baqillanî* (m. 1013), *el-Eqîdetu'l-burhanîyye* a Selalîcî (m. 1197), *el-Mufide* ya Senûsî (m. 1490), *Eqidetû Ehli'l-Îman* ya Ebdulqadir el-Fasî (m. 1680) wek nimûne ji berhemêne 'eqâidê ne ku bi taybet ji bo jina hatine nivîsandin, em karin destnîşan bikin.⁸

Nivîsandina berhemêne menzûm çawa ku di warê fiqh, hedîs, sîyer, serf û nehwê de têne dîtin, di mijarê 'eqîdeyê de jî xwe nîşan didin. Çend sedemêne nivîsandina berhemêne 'aqîdeyêne menzûm ev in : Bi kurtasî û bê nîqaş rave-

4 Kadrî Yıldırım, *Ehmedê Xanî Külliyyati II*, 'eqîdeya Îmanê, Avesta, r.42, İstanbul, 2008

5 Kilavuz, hb. r.213

6 Kadrî Yıldırım, hb. r.42

7 Songül Karaca, Kadızâde Mehmed Efendi, *Manzûme-i Akâid*, (inceleme-tenkitli metin- sözlük-dizin), Yüksek Lisans Tezi, Recep Tayyip Erdoğan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı, 2012, r.3

8 Ahmet Çelik, *Înanç Eğitimi Açısından Mağrib'te Kadınlara Yönelik Yazılan Akîde Eserleri*, Atatürk Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, h. 43, Erzurum 2015, rr. 442-446.

kirina mijarê, asankirina perwerdehiyê, ezberkirin û di hiş de mayîn û ji bo fêrbûna kesên ku bi ‘erebî nizanîn, bûye sedema nivîsandina berhemên ‘eqîdeyên menzûm. Helbestvaniya nivîskar, tradisyona avakirina berhemên menzûm û komkirina hemû nêrînên mezhebekî di berhemê de jî, bûye hin sedemên din ji bo avakirina ‘eqîdeyên menzûm.⁹

Di nav de çend rîzperr/istîsna hebin jî bi gelemerî ‘eqîdeyên menzûm bi teşeya mesnewîyê hatine nivîsandin û wek cûreyeke berhemên edebî di nav edebiyata rojhilata navîn de gelek nimûne jê dikare bê dîtin.

Taybetmendiyên ‘eqîdeyên menzûm bi vî şeklî em dikarin dest nîşan bikin.

- Bi gelemerî bi teşeya mesnewî hatine nivîsandin.
- Li ser wezna ‘erûzê ava bûne.
- Ziman asan e.
- Ji bo perwerdehiyâ xwendekarê medreseyan hatine nivîsandin
- Bi giştî ji bo ‘eqîda Ehlî Sunnet wel-Cemaet ava bûne.
- Ji ber ku mijarêن ‘eqîdeyê ne , ‘ezabê gorê, bihişt, dojeh, qiyamet jî tê de hatine ravekirin.¹⁰

1- DÎ EDEBÎYATA ‘EREBAN DE ‘EQÎDEYÊN MENZÛM

Di edebiyata ‘Ereban da yekem car menzûmeyên didaktîk di dewra Emewîyan de, di warê fiqhî, hedîs û tefsîrê de tê dîtin û hinek guherînên biçûk çê bûbin jî ev tradisyona menzûmeyên didaktîk di dewra ‘Abbasîyan de jî didome. Di dewra Abbasîyan de şârekî bi navê Ebân b. Abdilhâmid el-Lâhikî di van mijaran de gelek berhem anîye holê û wek pêşengê menzûmeyên dîdaktîk tê nasîn. Bi navê Rojî û Zekâtê menzûmeyeyeke wî heye.¹¹

Di edebiyata ‘Ereban de ‘eqîdeyên îmanê wek beşê binî jî edebiyata dîdaktîk cih girtiye, gelek berhem derketine pêş. Ji nav van berheman a herî navdar *El-Emâlî* ya Üşî ye. Ev berhem ji 66 beytan pêkhatiye û di medreseyan de hatiye xwendin. 7 şerhê wê bi ‘Erebî û çar şerh û çar wergerê wê bi Tirkî hene.¹² Navê hin berhemên ‘eqîdeyên menzûm di edebiyata ‘Ereban de ev in.

- *Kasîde-i Nûniyye (Cevâhiru'l-Akâid)*- Hızır Bey- 105 beyt
- *'Uqûdu'l-'Aqâid fî Funûni'l-Fevâid*, İmâm-zâde Ruknuddîn Sedîuddîn

9 Ahmet Aydin, *Manzum Fikih Metinleri – I*, Usul İslam Araştırmaları, Sayı: 26, Temmuz-Aralık 2016, ISSN 1305-2632, s.137-147

10 Karaca, Songül, hb. r. 4-6

11 Ali İhsan Akçay, *Türk Edebiyatında Manzûm Akâidnâmeler: İnceleme Metin*, Doktora Tezî, Uludağ Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, İslam Tarihi ve Sanatları Ana Bilim Dalı, Türk İslam Edebiyatı Bilim Dalı, 2011, r.5-6

12 Karaca, hb. r. 6

- *Nazmu'l-Cevâhir*, Tâhir b. Arabşâh el-İsfahânî
- *Nazmu 'Aqâidi'l-Mardînî*, Alâaddîn Ebû'l-Hasan Ali b. Muhammed b. Ebî Bekr b. Şeref (el-Müserref) el-Mardînî
- *El-'Aqîdetü's-Seffârînîyye*, Abdullâh eş-Şemrânî- 210 beyt
- *'Aqîdetu's-Sarsarî*, Yahya b. Yusuf es-Sarsarî
- *Qesîda Emâlî*, Sirâceddîn Ali b. Osman el-Ûşî- 66 beyt
- *el-Îlâm bi-Hudûdi Qavâidi'l-Îslâm*, Kâdi İyaz
- *Cevheretu't-Tevhîd*- Ebû İshaq İbrahim b. İbrahim el-Lekânî- 144 beyt
- *el-qasîdetu'n-Nûniye*, İbn Qayyim el-Cevziyye-5949 beyt
- *el-'Aqîdetu's-Şeybâniyye*, Ebû Muhammed Yûnus b. Yûsuf eş Şeybânî-79 beyt
- *'Aqîdetu'l-Vâsitiyye*- İbn Teymiye
- *Aqîdetu'l-Avâm*- Muhammed Alevî el-Malikî¹³
- *Envâru'l-Uqûl fi't-Tevhid*-Ali Bahâurrahman el-Mennân
- *'Aqîde-*'Omer b. Ebi'l-Hasen el-Hanbelî
- *Ed-Durretu's-Sittîniyye fi Telhîsi'l-'Aqîdeti's-Sunnîyye*- Fahruddîn b. ez-Zubeyr Ebû'l-'Aliyye

2- DÎ EDEBÎYATA FARÎSÎ DE 'EQÎDEYÊN MENZÛM

Li gor jêderê ber destan di edebiyata farsî de em li rastî du 'eqîdeyê menzûm têñ. Yek te'lif e û yek wergera ji 'erebî ye.

- *Mîr'atu'l-'Eqa'id*- Molla Camî - 226 beyt e¹⁴
- *Necm-i Zeberkân*- Wergera *Qesîda Emâlî*, Sirâceddîn Ali b. Osman el-Ûşî ye¹⁵

3- DÎ EDEBÎYATA TÎRKÎ DE 'EQÎDEYÊN MENZÛM

Di edebiyata tirkî de hîn bêtir di sedsala 17 û 18an de em li rastî 'eqîdeyê menzûm têñ. Di vî warî de heta dema me gelek berhem hatine nivîsandin. Di edebiyata tirkî de 'eqîdeyê ku hatine nivîsandin wek du cûreyan em dikarin binirxînin. 'Eqîdeyê werger û 'eqîdeyê te'lîf.¹⁶

3.1- 'Eqîdeyê werger;

- *Fikh-i Ekber*- İmâm-ı Azâm
- *el-Vasiyye*- İmâm-ı Azâm

13 Akçay, hb. r. 6-10

14 Ahmet Sevgi, *Molla Câmî'nin Akâit Risalesi ve Türkçe Manzûm Bir Tercümesi*, Selçuk Üniversitesi, Edebiyat Fakültesi Dergisi, Yıl 2011, Sayı 26, s.1-4

15 Karaca, hb. r.8

16 Karaca, hb. r.10

- *Kasîde-i Emâlî-* el-Ûşî
- *Kasîde-i Nûniye-* Hîzır Bey
- *Îtikadnâme-* Molla Câmî
- *Vasiyetnâme-* Birgivî¹⁷

3.2- ‘Eqîdeyên te’lîf;

- *Ahvâl-i Kiyâmet-* Şeyyad Hamza-289 beyt e
- *Sîrâcu'l-Müslimîn-* Ali Şir Nevâyî-213 beyt e
- *Manzûme-i Akâid-* Kadızâde Mehmed Efendi-1528 beyt e
- *Hudâ Rabbim Manzûmesi-* Erzurumlu İbrâhim Hakkı
- *Nazmu'l-Leâlî-* Tokatlı İshak Zencânî-302 beyt e
- *Manzûme-i-Akâid-* Kadı Hüseyin Ispartavî-2037 beyt e
- *Zuhrü'l-Âhire-* Süleyman Nahîfî-756 beyt e
- *Kasîde-i Îtikâdiyye-* Kemâl bin el-Hâc Mehmed Salih Vecîhî Paşa-215 beyt e
- *Türkçe Îtikad Manzûmesi-* Veled Çelebi İzbudak-102 bend e
- *Ravzatu'l-Îmân-* Yusuf el-Maraşî¹⁸

4- DÎ EDEBÎYATA KURDÎ DE ‘EQÎDEYÊN MENZÛM

Edebiyata kurdî ya klasîk, wekî edebiyata ‘erebî, farsî, tirkî ya klasîk perçeyek ji edebiyata rojhilata navîn e. Di bin bandora edebiyata rojhilata navîn de maye û cureyên vê edebiyatê em di edebiyata kurdî ya klasîk de jî dibînin.

Şêx Ehmedê Xanî, bi nivîsandina berhemîya xweyî granbiha ya bi navê ‘Eqîdeya Îmanê, bûye pêşengê ev cûre berhemên edebî di edebiyata kurdî ya klasîk de. ‘Eqîdeyên ku piştî ‘eqîdeya Şêx Ehmedê Xanî hatine nivîsandin; bi naverok, teşeya nezmê, bikaranîna qalibê ‘erûzê, asaniya ziman, dûrbûna ji pêkanîna hunerên edebî, di bin bandora vê ‘eqîdê de mane. Ji bo îsbata van agahiyan ew ‘eqîdeyên ku em ê li jêr bidin nasîn ji me re bes in û pir in.

Li gor jêderên li ber destan bi devoka Goranî me tu agahî der barê ‘eqîdeyên menzûm nedîtin. Ku hebin ji em negîhîstin wan.

Bi devoka Soranî em gîhîstin du ‘eqîdeyên menzûm. ‘Eqîdeya Mewlewî a bi navê ‘Eqîdey Merdiyye, bi danışanên/ delîl ‘eqîdeyên menzûm nedîtin. Bi devoka Zazakî/Kirdkî ji, xwe bêpar nehiştiye ji vê cûreya edebî.

Tevî ku edebiyateke nûjen e ji, bi nivîsandina 5 berhemên ‘eqîdeyên menzûm devoka Zazakî/Kirdkî ji, xwe bêpar nehiştiye ji vê cûreya edebî.

17 Akçay, hb. r. 6-16

18 Karaca, hb. r. 10-16

Bi devoka Kurmancî gelek ‘eqîdeyên menzûm hatine nivîsandin. Nivîsandina ‘eqîdeyên menzûm ji Şêx Ehmedê Xanî dest pê kiriye û heya roja me jî didome. ‘Eqîdeyên ku em gîhiştin wan li gor jêderên li ber destan me der barê wan de agahî dest nîşan kir. ‘Eqîdeyên ku em negihîştin wan avê wan an navê nivîskarê wan di bin-binbeşekê de me nivîsand.

Her çiqas wek kêmasiyeke vê gotarê bê dîtin jî, ji ber ku em negihîştin jîyana temamê nivîskaran, bi sedema ku guncanî/ahenga nivîsê xera nebe me jîyana nivîskaran nenîvîsand.

4.1- ‘Eqîdeyên Sorânî

4.1.1- Mehwî- ‘Iqdul ‘eqaîd (m.1830/1906)

Ji 136 beytan pêk hatiye. Bi teşeya *Mesnevîyê* hatiye nivîsandin. Bawerîya bi Xweda, baweriya bi pêxemberan, îman û kufr, ‘eşereyê mubeşsere (Deh sehabiyên ku bi çûna bihiştê hatine mizgînkirin), tewbe mijarên vê ‘eqîdeyê ne. ‘Eqîda Mehwî, hemdem qesîdeyeke ‘nûnî’ ye. Hemû misrayên duwem bi herfa ‘n’ xelas dîbin. Nivîseke bi vê terzê di nav ‘eqîdeyên ku li ber dest in nehatiye dîtin. Di vî warî de ‘eqîda yekem e. Herdû beytên pêşî û dawî ev in.

Mesûlîme i'ane le wehhâbî muste'an

Her lew dekem sual û, dekem hemdî ew be can

...

Baqî le fezlê xwotewe ser rohî ehmedî

Nazil bikey selat û selamî leh ed fuzûn¹⁹

4.1.2- Mewlewî-‘Eqîdey Merdiyye (m.1806/1882)

‘Eqîdeyeke gelekî mezin e. Di edebiyata kurdî de ‘eqîdeya herî mezin e. Ji 2441 beytan pêkhatiye. Destpêk, mebhesu’s-selatî we’s-selâm, mebhesu’l-îman, mebhesu’l- wucûdî wel wucûb, mebhesu’l-wehdetî, mebhesu’l-îmanî billahî te’ala, mebhesu’l-heyât, mebhesu’l-‘ilm, mebhesu’l-îradetî, mebhesu’l-qudretî, mebhesu’l-semî’ we’l- beserî we’l-kelam, mebhesu’l-beqaî we’t-tekwîn, mebhesu’l-esmaî, mebhesu’l-ef’alillahî we hîkmetîhî, mebhesu’l-husnî wel qubhî, mebhesî ruyetullahî te’ala, mebhesî wesfi’l-melaîketî, mebhesu’l-îmanî we’t-tesdîqî bî cemî’îl kutûbî’s- semawiyetî, mebhesî fi tehqîqî kelâmîllahî te’ala, mebhesu’l-enbiyâî we’r-rusûlî ‘eleyhîmu’s-selam, mebhesu’l-xatemiyyetî, mebhesu’l-îsrâ we’l-mî’racî’r-resûl, mebhesu’l-kerametî, mebhesu’l-xewariqî, mebhesî îmtîhani’l-ewlîya, mebhesu’l- xulefaî we’s-sehabetî, mebhesî yezîd, mebhesu’l-xîlafetî we’l-îmametî, mebhesu’l-hesenî wel huseyn rediyallahû te’âlâ ‘enhûma, mebhesu’l-eîmmetî fi’l-ûsûlî we’l-furû’ we’tterîqetî we eqtâbîha, mebhesî hedretî eş-şeyx

19 Mehwî, *Dîwanî Mehwî*, wêşanên Nefel, r. 120-132, Stockholm, 2007

‘usmân sîraceddîn we ewladîhî qeddesellahû esrârehum, mebhesu'l-îmanî bi'l-yewmi'l-axirî we 'elameti'l-axîretî, mebhesu'l-munkerî we'nnekîrî, mebhesu'l-axîretî we'l-me'ad, mebhesu'l-hîsabî we'l- kîtabî we'ssîratî we'l-mîzân, mebhesu'l-cennetî we'nnâr, mebhesî beqai'l-cennetî we'l- cehîmî, mebhesu'l-şefa'etî, mebhesu'l-qedâ we'l-qeder û xatîme navêن besêن 'eqîdeya Mewlewî ne.

Herdû beytên pêşî û dawî ev in;

Zubdey 'eqîdew xulasey kelam

Her le tow û bo tos hemd û senay 'am

...

Nîza' berya we degel xas û 'âm

Sehhel 'eqîde we temel kelam²⁰

4.2- 'Eqîdeyêن Zazakî

Heta niha bi devoka zazakî pênc 'eqîdeyêن menzûm hatine peydakirin.

4.2.1- Şêx Muhemedê Şêx Ensarî- Raro Raşt(m.1879/1976)

324 beyt e û bi teşeya mesnewî bi 'erûzê hatiye nivîsandin. Behra wê Muteqarib e û qalibê wê jî fe'ûlun fe'ûlun fe'ûlun fe'ûl e. Herdû beytên pêşî û dawî ev in;

Heçî hemd hemey jîn Allah rî temam

Resûl bêjê ser o selat û selam

...

We him mu'mîn û mu'mînat ecme'în

Bidi xatirê Xatemu'l-murselîn

'Eqîdeya Raro Raşt ji destpêkek û 21 beşan pêk hatiye. Navê besêن wê ev in: Erkanê îslamey, erkanê îmanî, sifatê ellah heçî zatîyey jey, ino mebhes ê sifatê selbîyew, sifatê ellah heçî qedîmîyey ki subûtîyey, inca melaîketandê homay ra behs keno, inca kitabandê homay ra behs keno, inca 'ededê enbîyandê homay ra behs keno, mebhes u't-tefazul, sifatê peygembera hemînî, inca 'elamatê qiyamet ra behs keno, inca cuzî îxtîyarey ra behs keno, mebhes u'r-rîsâle, mebhes ê şemaîlandê muhemmed sellallahû te'ala 'eleyhî we selleme, inca mî'racdê peygemberî ra behs keno, inca ru'yetê cemaleyda ellah ra behs keno, inca te'sîrdê du'an a behs keno, mebhes ê nesbu'l-îmamî, inca sualdê qebri ra we ehwaldê qiyametî ra behs keno, mebhes ê adabdê nimajî, mebhes ê wardîşî.²¹

20 Mewlewî, -'Eqîdey Merdîyye, lêkolînewe û lêkdanewe mela 'Ebdulkerîm Muderris, pêndaçûnewe Fatih 'Ebdulkerîm, muntedî iqres-seqafî, 1988.

21 Bilal Zilan, *Di Kitabê Muhemedê Şêx Ensarî: "Raro Raşt" û "me'lûmatê Dîniye"* (metn û cîgîrayış), Unîvîrsîteya Artukluyî ya Mêrdînî Enstîtuya Ziwananê Ganîyan yê Tirkîya Şaxê Mayzanistê Ziwan û Kulturê Kurdan, Tezê Lîsansê Berzî, r. 24-25, Mêrdîn, 2016

4.2.2- Mela Mehmed Eli Hunî- Eqîdey Îman-Eqîdey Islam (m.1930)

66 beyt e. Bi teşeya Qesîdeyê û wezna heceyê hatiye nivîsandin. Îman, tewhîd, sifatê Xweda, şeş ruknê îmanê û şîroveya wan, mijarênen sereke ên vê ‘eqîdeyê ne. Wek mînak hin beyt ji vê ‘eqîdê;

Hey ya însan ya însan

Homay yew bîya îman

Tu biwan 'ilm û îrfan

Bizan eqîdey îman

...

Vonû, Veynen', Virazen'

Eşkenû Şerr nêwazen'

Zanû, Eşnawen', Wazen'

Bizan eqîdey îman²²

4.2.3- Mela Muhemmedê Hezanî- 'Eqîdetu'l-Îmanî (m.1939)

Bi şiklê mesnewîyê bi wezna ‘erûzê, bi behra remela nesalim li ser qalibê *fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun* hatiye amade kirin û bi giştî 144 beyt e. Her çi qas ev menzûme bi navê ‘Eqîdetu'l-Îmanî hatiye nasîn jî, lê belê 96 beytên pêşî ‘eqîde ye û beytên mayin fiqh e. Ruknê îslamê û ruknê îmanê, sifatê Xweda, bawerîya bi pêxemberan û mi'rac wek mijar di vê menzûmeyê de bi cih bûne. Herdû beytên pêşî û dawî ji mijara ‘eqîdeyê ev in;

Ewwilê destkerdişê eşyan temam

Vatişê ma namê Ellah ze'l-meram

...

Qey 'eqîdî vatişê ma bîy xîtam

Şafi'ê ma ro bivarê se selam²³

4.2.4- Ali Sizerî- Seruven-i Mahşeri (m.1950)

Mijarênen girêdayî bi roja Qiyametê û heşrê di vê berhemê de tên ïzahkirin ku ev mijar jî, ji mijarênen ‘eqîdeyê tên hesibandin. Bi tîpêñ latînî hatiye nivîsandin. Di 2007an de du cara di nav weşanên Şenol yayincılık de hatiye weşandin.

Bi wezna hecê bi teşeya mesnewî hatiye nivîsandin. Hejmara beytên wê 382 ne. **Her dû beytên pêşî ev in;**

Bîsmîllâhî vaje hem dest pê'bike

Behsê merg û axrette ma go bike

22 Zilan, hb, r.24-25

23 Zilan, hb, r.26-27

*Çiyko behs keno kîtab ma nûsenê
Behsê qiyamette ma dest pê'kenê²⁴*

4.2.5- Mela Mehemed Demîrtaş- Qesîdeya Diyîn (m.1936)

Di formata mesnewiyê de hatiye amade kirin. Mijarên ruknên îslamê, ruknên îmanê, tewhîd, helal, heram, zekât û wd. tê da bi cih bûne.

Malikên Pêşîn û Paşîn:

*Ma bi bîsmîllahî dest pey kenî her cî ra verî
Hemd û sena qey Ellah rî ma bî abd û rehberî*

*Ferzî ma nuştî vaji ma bizûni bîyari ca
Ma emelkî qey Ellah dî sahîh û, îmûnî ma²⁵*

4.3- ‘Eqîdeyên Bi Devoka Kurmancî

Bi vê devokê gelek ‘eqîde hatine nivîsandin. Em gîhîstîn hin ‘eqîdeyan û me li jêrê danasîna wan kir. ‘Eqîdeyên ku em negîhiştîn wan wek binbeşek vê gotarê me navê wan û navê nivîskarê wan bi bîr anîn. ‘Eqîdeyin li ber dest jî ji ber ku nivîskar ne diyar e me di vê gotarê de ji wan behs nekir. Lewra tê famkirin gelek ‘eqîde hîn nehatine tomarkirin.

4.3.1- Şêx Ehmedê Xanî- ‘Eqîdeya Îmanê (m.1651/1707)

Bi teşeya mesnewî, bi wezna ‘erûzê, bi behra muteqarib, bi qalibê *fe’ûlun, fe’ûlun, fe’ûlun, fe’ûl* hatiye nivîsandin û ji 70 beytan pêk hatiye. Di edebiyata kurdî de li gor jêderên li ber destan ‘eqîdeya yekem e. Di edebiyata kurdî de yekem berhemâ dînî ye. Bandora wê li ser ‘eqîdeyên ku piştî wê hatine nivîsandin eşkere xwuya dike.²⁶ Herdû beytên pêşî û dawî ev in;

Li bate mûheqqeq bitin ev cewab

Duhû gote min hatifê bê hîcab²⁷

...

Min û cümle ê ummeta Mustefa

Bibî cennetê tabi’ê Mustefa²⁸

24 Zilan, hb, r.27-28

25 Metîn Çiftçi, *Edebiyatê Zazakî yê Klasik de Eqîdenameyi*, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, Yıl:1, Cilt1, Sayı 2, Kasım 2015, r.117-119

26 Kadrî Yıldırım, h.b r. 42-43

27 Kadrî Yıldırım, h.b.r. 175

28 Kadrî Yıldırım, h.b.r. 333

4.3.2- Mela Xelîlê Sêrtî –Nehcu'l-Enam(m.1754/1843)

Nehcu'l-Enam bi teşeya mesnewî li ser behra muteqarib bi qalibê *fe'ûlun*, *fe'ûlun*, *fe'ûlun* hatiye nivîsîn. Ji 274 beytan pêk tê. Mela Hilmî Qoxî ev berhem şerh kiriye. Ji Nehcu'l-Enamê em du malikan li jêr dinivîsinin.

Tu guh dêre nutq û beyana fesîh,

Ji bo ferzû 'eynane merdê melîh

...

Melaîk ji bo wî hene bê 'edîd,

Mudamî 'ibadet dikin bê meded²⁹

4.3.3- Evdirehîm Rehmîyê Hekkarî- 'Eqîda Kurdi (m.1958)

Dînê me, şûrûtu'l-îman, amentû bîllahî, we melaiketîhî, we kûtûbîhî, we resûlîhî, sifati'r-resûl, 'elametissa'etî, we'l-yewmi'l-axirî, Hedretî Mûhemmed 'elehisselat û wesselam û tarîx 11 besên vê berhemê ne. Mijarêni di vê berhemê de bi cih bûne ji navêñ beşan xwuya dibin. Bi giştî 74 beyt e û bi teşeya mesnewîyê hatîye nivîsandin.

Her dû beytêñ pêşî;

Elhemdûlîllah dînê me Îslam e heqe em muminîn

Tabî'ê şahê Emînin ummeta Wî muslimîn

Ruknê dînê me ku pêncin tû bizane ey 'ezîz

Ya ewel kelîma şehadet tû bibêje pak temîz

Her dû beytêñ dawî;

Tû bi xwûne wê 'eqîdê hem tû berke wesselam

Ji 'eqîdê Hemden Lillah gotî min temmel kelam

Ne ewwel û axir ku yêke sanî û salis ku sî

Qenc tefekkur ke bi zane bûye tarîxa ewî³⁰

4.3.4- Mela Ehmed Heyderî- 'Eqîdeya Îmanê (m.1887/1937)

Bi teşeya mesnewîyê bi wezna 'erûzê li ser behra hezeca nesalim bi qalibê *mefa'îlun*, *mefa'îlun*, *fe'ûlun* ji çar beşan pêk hatiye. Navêñ beşan ev in. Destpêk, ruknêni îslamê, ruknêni îmanê û xetîme. 'Eqîde bi giştî 225 beyt e.

29 Ahmed Hîlmî Qoxî, *Rehberê 'Ewam Şerha Nehcu'l-Enam*, İhsan Yayınları, İstanbul, 2004

30 Tehsin İbrahîm Doskî, 'Eqîdenameyêni Kurmancî, Çapxaney Hecî Haşim, r. 19, 26, Hewlêr, 2010

Beyta destpêkê wiha ye:

Ji ewwel hemdê bêhed bo Xuda bit

Selamu-llah li ruhê Mustefa bit

Beyta dawîn jî wiha ye:

Ji bona Heyderî Ehmedê bedkar

Bixwînin fatîhek îxlasê sê car

4.3.5- Mela Mihemmed Emîn Heyderî - 'Eqîda Îmanê (m.1927/2003)

Ev 'eqîde ji heşt beşan pêkhatiye. Destpêk 12 beyt, behsa bawriya bi xwedê te'ala 8 beyt, behsa baweriya bi melaîketê xwedê te'ala 9 beyt, behsa bawerîya bi kîtabê xwedê te'ala 8 beyt, behsa baweriya peyxemberê xwedê te'ala 10 beyt, behsa wesfê Mûhemmed sellellahû te'ala 'eleyhi wesellem 69 beyt, behsa 'elametê qiyametê 31 beyt, behsa baweriya qiyametê 37 beyt, îstîxase û hewâr 24 beyt e. Bi giştî 208 beyt e. Her çar beytên pêşî ev in:

Bi hemdê Xwûda yê ku tewfiq ji wî

Bi şukrê Xwûda yê hîdayet bi wî

Selat ser Mûhemmed nebîyyê di wî

Di gel al û eshab û etba'ê wî

Birayê musulman ji dil guh bide

Ewê ferdû'eynin di dînê te de

'Eqîdê beyan kim tu guh lê bikî

Ji bo ê nezan dînê xwo fehm bikî

4.3.6- Mela Mihemmed Şah el-Metmûrî - 'Eqîdeti'l- Islamîyyetî Wel Mew'îzeti'l-Hesenetî (m.2002)

Li gor nusxeya li ber destê me di sala 1996an de hatiye nivîsandin. Di serî de bi du beytan wiha dibêje;

Bi nûnekî sakin çêkim ez nîzam

Da işqê bigirin qulûb ê sûmam

Di 'ilmê ledun de bikin tum dewam

Pê hîn bin temamên biraê 'ewam

Piştî van her dû beytan beşa destpêkê heye. Ev beş 15 beyt e. Piştî vê beşê 'eqîde di bin sernavê 'Mebhesa 'Eqîda İslâmî' dest pê dike. Ev behs ji 99 beyta pêk tê.

Hersê beytên serî evin.

Bi navê Xwûda ê Rehîm û rehman

Em çêkin ‘eqîdek bi Kurdî ziman

Jî bo zanîna wan bira ê şîrîn

Bi rukn û erkân û fûrudat ê dîn

Bizanin nemînin di destê le’în

Ne kêşin ‘ezab ew di narê hezîn³¹

4.3.7- Seyyîd ‘Ebdûlqadîr Erzen - Eqîda Îmanê Ji Bo Muminêñ**Cîhanê (m.1962)**

Di sala 2013an de hatiye nivîsandin. Bi tîpê latinî hatiye nivîsandin. Di serî de pêşgotineke bi mensûrî/pexşanî heye. Piştî vê pêşgotinê beşa *hişyarîyê* heye. Ev beş 12 beyt e. Nivîskar di serî de ruknêñ îslamê ïzah dike. Paşê, bi berfirehî behsa ruknêñ îmanê dike û berhema xwe bi beşa *dawî* xilas dike.

Ev ‘eqîde ji hezar û du sed (1200) beytî zêdetir e. Bi vê hejmara beytên xwe, di dîyalekta kurmancî de ‘eqîdeya herî mezin e.

Hersê beytên pêşî ji ‘eqîda Seyyîd ‘Ebdûlqadîr Erzen ev in:

Bi hemdillah min çêkir ev kîtab e

Xwûda bo me biggerîne sewab e

Hemû me’na Ayet û Hedîsan e

Ne ku ji ber xwo min ev nivîsan e

Gelek pêwistî heye bi evan e

Jî bo xort û zarokêñ me Kurdan e³²

4.3.8- Melle ‘Ebdulwehab Öncü (Berنىشتى) - Eqîda Îmanê (m.1937)

Ji xeyrê her duwazdeh rêzêñ bi secî ku wek destpêkekê xwuya dike, ev ‘eqîde ji 156 beytan pêk hatiye.

Serê Berhema Melle ‘Ebdulwehab wiha dest pê dike.

Eeey birayê ‘ezîz û guhdar

Pir rind û pak û dîndar

Berê xwo bide rêya Xwûdayê Cebbar,

Berê xwo mede rêya kaş û çewt û xwar û mar

Ku ew rêya pîs, rêya şeytan ê xeddar

Hûnê bibin poşîman û belengaz û jar

31 Abdulhadî Ertekin, *Mela Yasîn Yusîrî û Eqîdenameya Wî Ya Bi Navê Ed-Durru’s-Semîn (metn-lêkolîn-ferheng)*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtûya Zimanê Zindî yên li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, r. 6, 2017

32 Abdulhadî Ertekin, hb. r. 6

*Bi şûnde vegarandin tune,
 Cuqas hûn bikin qêrîn û gazî û hewwar
 Guhdarî bikin ezê bo we bêjîm tiştekî bi nezm û qa'îde
 Ji dil hişyar bin tê da heye ji bo dînê we gelek faîde
 Bi navê Xwûda Xalîqê bê zewal,
 Gelek hemd dikim ez ji bo Zu'l-celal
 Li canê Mûhemmed resûlê hînar,
 Bibarin Selat û Selam bê jîmar
 Digel al û eshabê Wî pir delal,
 Ji bo dîn telef kirne pir can û mal
 Piştî Besmelê, Hemdelê, Selwelê,
 Beyan kim bo we 'ehda Qal û Belê³³*

4.3.9- Mela Ehmed Nas (Zinarexî)-Xulasa ‘Eqîda Musulmanê Sunnî (m.1937)

Di sala 1992an de hatiye nivîsandin. Mela Ehmed Nas, beşên berhema xwe bi navê ‘Behs’ ji hevûdû vegetandiye. Di bin *Behsan* de ‘Fesl’ bi cih kirîye. Berhem ji 3 behs û xatîmeyekê pêk hatiye. Behsa yekem, 33 beyt e. Behsa duwem, 84 beyt e. Behsa sêyem, 218 beyt e. Xatîme, 123 beyt e. Bi tevahî digihêje 458 beytan.

Hinek beytên ‘eqîdeya Mela Ehmed Nas ev in :

*Nuho ku me halo nîyet kirî ya
 Em çêkin li ser mezhebê Sunniya
 'Eqîdek-ji nezana re hem zarûwa
 Bi Kurmancî bî ew bi ezmanê wa
 ...
 Heye bawerî me bi resûlê Xwûdê
 Digel wê şeri'et û teblîx didê
 Bi ehkamê tekîfiyû wed'iye
 Mêr û hurr û jêra wehî hatiye³⁴*

4.3.10- Mela Yasîn Yusrî (Mele Yasînê Şemê)-Ed-Durru's-Semîn (m.1906-1994)

Hem bi teşeya nezmê û hem bi cûreyê berhema *Mesnewî* ye. Qalibê ‘erûzê; muteqariba heşt pêngavî nesalim (mehzûf) e. Kêşa wê *fe'ûlun fe'ûlun fe'ûlun fe'ûl* e. Bi giştî 72 beyt e.

33 Abdulhadî Ertekin, hb. r.7

34 Abdulhadî Ertekin, hb. r. 7-8

Beyt 1-4: Her çar beytên pêşî hemdê Xwedê û selewatê li ser Resûlê Xwedê, malbat û heval û yarêne wî ne.

Beyt 4-6: Naveroka bawernamê cih digre.

Beyt 6-9: Sebeba nivîsandina berhemê aşîkar dike.

Beyt 10: Navê berhemê diyar dike.

Beyt 11-13: Hejmara ruknên îmanê dibêje û pêwistiya baweriya bi wan rave dike.

Beyt 14-24: Bi yazdeh beytan ruknê îmanê ê yekem ku baweriya bi Xweda ye şîrove dike, sifatê Xweda ê zatî, subûtî, wucûdî û ezelî yek bi yek bi xwendevanan dide nasîn.

Beyt 25-33: ji ruknê îmanê ê duyem, baweriya bi firişteyên Xweda û naskirina hinek firişteyan em di van beytan de dibînin.

Beyt 34-48: Ruknê sêyem ji ruknê îmanê baweriya bi pirtukên ku Xweda şandiye ji insanan re, çend suhûf/rûpel ji kîjan pêxemberî re hatiye, kîjan pirtûk ji kîjan pêxemberî re hatiye, giringiya Qurana pîroz û hinek wesfîn Qurana pîroz em di van 15 beytan de agahdar dibin.

Beyt 49-55: Bi heft beytan baweriya bi pêxemberên Xweda ku ji ruknê îmanê ê çarem e hatiye an ravekirin. Sifetên pêxemberan û hinek taybetiyêن wan jî em di van malikan da dibînin.

Beyt 56-64: Ji ruknê îmanê ê pençem baweriya bi roja qiyamet û heşrê ye. Girîngiya vê rojê, amadekirina cehennemê, pira siratê, weznandina xêr û gunehan em bi neh beytan dinasin.

Beyt 65-67: Ev her sê beyt mijara qederê ku ruknê şeşem e tîne zimên.

Beyt 68-69: Bi du malikan hejmara ruknê îslamê û navê wan sedema bawerîyan ci ye bi hêsanî, bi zimanekî herikbar û şâ'îrane anîye pêşberî me.

Beyt 70-72: Mela Yasîn di beyta 70an de ji xwe re dû'a kiriye û di her dû beytên dawî de jî selat û selamê Xweda ji pêxemberê me Muhemmed (a.s.) û heval û hogir û malbata wî re xwendiyê.

Herdû beytên pîşi:

Dikim bo te şukr û senaya kerîm

Bikî tu bi wan zêde serme ne'îm

Her dû beytên dawî:

We hem di li ser al û sehbê kiram

We etba'ê wan ta bi roja kiyam³⁵

35 Abdulhadî Ertekin, hb. r. 14-25

4.3.11- Mele Xalidê Zengokî Batikî- Menzûmeya Eqîdeyê (m.1978)

Ji destpêkek û 18 besan pêk hatiye. Li gor hejmara beytên herdû rûpelên pêşî û rûpela dawî divê ev ‘eqîde 651 beyt be³⁶. Ji aliyê naverokê ve mijara berhemê; ruknê iman û Îslam û pirsên fiqhê ne.

‘Eqîde weha destpê dike;

Bi navê Xudayê hemî mexluqat

Ku Ellah e daîm bi navê lîzat

Errehmanî rizqa dide ew semed

Errehîmî rehmê dike bê ‘eded

Eqîde dibêjim bi îznê Xuda

Elhemdû lîllahî di her lehzê da

Bi van beyta bi dawî dibe;

Ya ‘ebdek azad ke ji bo rojekî

Ya du meha rojî bigir weqtekî

Weyaxud te’am bide şêst fuqara

Hem bi girî tewbe bike pur cara³⁷

4.3.12- Mele Ebdulhadiyê Comanî- ‘Eqîdeya Îmanê (m. 2004)

Bi teşeya mesnewîyê hatiye nivîsandin. Li gor îstînsaxa Zeynelabidînê Amidî di nav 13 rûpelan de ku di her rûpelekê de 16 beyt cih digire hatiye nivîsandin. Beşa ‘eqâidê û li dawîyê besa îltîcayê wek du bes di vê ‘eqîdeyê de ne. Li gor hejmara rûpelan û beytên di rûpelan de bi cih bûne divê ev ‘eqîde ji 190 beytan pêk hatibe.

‘Eqîde weha destpê dike;

‘Eqîdem ev e pê dibim Musliman

Li ser her kesî ferz û ‘eyn e bizan

Çi erkanê Îslamê pêncin yekîn

Sêşin yê Îmanê ji bo ehlê dîn

36 Abdullah Ekici, *Zeynelabidînê Amidî: Jîyan Berhem û Xebatê Wî Yêñ Destnivîsî*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtûya Zimanêñ Zindî yên li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, r. 177, 2014

37 Abdullah Ekici, hb.r. 84-85

Û bi van beyta bi dawî dibe;

Di sala hezar û we sî mîetê

Di gel heştêyû çarê çû j hîcretê

Di bîstê temûzê di weqtê duha

Ji bo nazimê zarî el fatîha³⁸

4.3.13- Şêx Ehmedê Feqîr - Menzûmeya ‘Eqâidê (m.1832)

Ev ‘eqîde ji deh besan pêk hatiye. Cudahîya vê ‘eqîdeyê ji yên mayîn ev e ku menaqêbê her çar Xulefayê Raşîdîn, Hezretê Hesen û Huseyîn û Şêx ‘Ebdulqadirê Geylanî jî di xwe de girtiye. Nivîskar ji bo her yekî beşek amade kiriye. Bi teşeya mesnewîyê hatiye nivîsandin û bi tevahî 163 beyt e. Taybetmendiyeyeke vê berhemê ev e ku herdû beşen pêşî û beşa dawî ne tê de her heft beşen din her yek bi 14 beytan hatiye nivîsandin.

Destpêk weha ye;

Ser defterê îsmî îsmê Allah

Daîm ew e muste‘an billah

Îsmê te ye îbtîdaê esma

Zatê qedîme la kel eşya

Bi van her dû beyta bi dawî dibe;

Ya Rebbî tu bikî bi heqqê Bazî

Ji Ehmed tu xerabiya ne xwazî

Lewra mûtemessikê terîq e

Barî bi wîra bibe şeft’ e³⁹

4.13.14- Hacî Ebdulfettahê Hezroyî - Menzûme Fi'l-'Eqaid (m.1892-1975)

‘Eqîdeyeke biçûk e. Bi teşeya qesîdeyê hatiye nivîsîn/nûsîn. Bi giştî 63 beyt e. Destpêk weha ye;

Di tewhîda Xwûda da 'ebdê kemter

Di bêje nezimkê wek 'uqdê cewher

Qedîme xaliqe mewlaye mewsûf

Bi ewsafê kemalê ey hunerwer

38 Abdullah Ekici, hb.r. 119-120, 193

39 Mehmet Zahir Ertekin, *Şêx Ehmedê Feqîr û Dîwana wî*, Arşîwa taybet. Ev behrem bi pîtê ‘erebî bi nivîsa başûr hatiye nivîsandin. Wek pdf li ber dest e. Lê ji ber ku bê berg e nivîskar û weşanxane ne dîyar e.

Dawî bi van beyta di qede;

Îlahî rehmeta te bom e meqsûd

Li fethî tu birêj feydê ji her dur

Tehîyyat selat û hem selaman

Li mewlaê mew hem cumle perwer⁴⁰

4.3.15- Mela Muhemmedê Hezanî- ‘Eqîdetu'l-Îman (m.1939)

Bi teşeya mesnewîyê ava bûye. Bi giştî 118 beyt e. 78 beytên serî ‘eqîde ye. 40 beytên dawî fiqh e. Mijarêن fiqhê bi sernavê ‘fesl’ê wek beşekê bi navê ‘fi beyanî be'zel mesâîlî'l-fiqhîyyetî’ cuda kiriye.

Her dû beytên pêşî evin;

Navê Allah her tû wî dest pê bike

Hem li pey Rehman Rehîmî çê bike

Hemdê wî ket û ji ber ìn'amê tam

Ber Mûhemmed sed selat û sed selam

‘Eqîde bi van beyta xilas dibe;

Ey Mûhemmedê Hezanî her mûdam

Bêje ber Ehmed Mûhemmed sed selam

Esselat û wesselamû ya Resûl

Al û eshabê te bin sahib qebûl

Tarîxa hicrê ji bo nezmê bizan

Xeyn û ta û cîm jimar be ey cûwan⁴¹

4.3.-16- Mele Nesreddînê Zoqeydî- Eqîdetu'l-Îman (m. 1935)

Destpêk, erkânû'l-îslam, erkânû'l-îmanî, mebhesî ehwalî ebnaî'd-dûnya we'zzecrî 'enha û mebhesî ricael feqîr îleyhî subhanehû we te'ala ed-du'aî lî nefshî we lî walîdeyhî wek çar beşen sereke di 'eqîdê de bi cih bûne. Di binbeşa erkânû'l-îslam de her pênc ruknêن îslamê û di binbeşa erkanul îmanê de jî her şes ruknêن îmanê cih digire. Ji van beş û binbeşan mijarêن ‘eqîdeyê jî eşkere dibin. Bi giştî 152 beyt e û bi teşeya mesnewîyê hatiye nivîsandin.

40 Doskî, Hb. r. 46-50

41 Doskî, H.b. r. 61-70

Bi van beytan dest pê dike;
*Bi navê Xwûda ez dikim îptîda
 Çi navekî şîrîne navê Xwûda*

*Digel hemd û medh û sena û şükür
 Ji bo wî Xwûdaê ku emrê me kir*

Beytên dawî evin;
*Di mîzanê bêje mebe tû melûl
 Fe'ûlun Fe'ûlun Fe'ûlun Fe'ûl*

*Di nam û di weznê bibe tû besîr
 Fexuz ìnne haze'l-emre yesîr*

*Xwûdê rehmetê ke li nazim mûdam
 Digel esl û fesl û hewaşî temam⁴²*

4.4- ‘Eqîdeyên ku em negihîstîn wan

- Şêx Ebdullahê Şemdînî -Xulaseyê Eqâid.
- Şêx Muhammed Hezîn -Cewheretu'l-Îman, 200 beyt.
- Hacî Ebdulfettahê Hezroyî -Tercumeya Bed'ul-Emalî.
- Şêx Hebîbê Qadî -Menzûmeye 'Eqâid.
- Mele Yasînê Şemê -Tuhfetu'l-Esdîqa, 333 beyt.
- Mele Ebdulhadiyê Comanî -Manzûme fi-ridde.
- Mele Ehmedê Delikî -Eqîdetu'l-Îman-Gulçiqîna Xort û Zarokê Kurdan,
 418 beyt.
- Şêx Mûsayê Mêrdînî
- Muhemmed Helîmê Xursî
- M. Şefik Aksu⁴³
- Mela Nûrulahê Godişkî: Çenta Yetîman⁴⁴
- Şêx Sahib Varol (m. 1983), Eqîdeya Îmanê⁴⁵
- Mela 'Elî 'Ilmî -'Eqîde⁴⁶

42 Doskî, H.b. r. 29-42

43 Zilan, hb. r. 18-19

44 Abdurrahman Adak, *Helbestvanên Klasîk ji Perspektîfa Herêmî: Nimûneya Herêma Bedlîsê*, The Journal of Mesopotamian Studies, C: 1/1, Havîn 2016, r. 39

45 Abdurrehman Adak, *Nêrîneke Giştî Li Ser Helbestvanên Kurdînûs yêñ Herêma Şîrnexê*, Nûpelda, hejmar 9, behar, 2012, r. 29

46 Necatê Zivingî, *Dîwana mela 'Elî 'Ilmî-Jiyan, Berhem û Helbestêñ wî*, Banqa Heq, 2012, İstanbul, r. 33-34

ENCAM

‘Eqîdeyên menzûm çawa cih didin xwe hevok bi awayekî din bê vegotin dê baştir be. Wek mînak: cihê xwe di edebiyata kurdî de girtine.

‘Eqîdeya Mewlewî a bi navê ‘Eqîdey Merdiyye ‘eqîdeya herî mezin e. Bi devoka Soranî hatiye nivîsin. Hejmara beytên wê 2441 e.

Bi devoka zazakî bi giştî 5 ‘eqîdeyên menzûm peyda bûne.

Bi devoka kurmancî gelek ‘eqîdeyên menzûm hatine nivîsandin. Em gihîstîn 16 berheman û me danasîna wan kir, 13 ‘eqîdeyên menzûm jî di lîteratura Kurdî de em ji hebûna wan agahdar in lê em ne gihîstîn wan.

Bi devoka Kurmancî cara yekem Şêx Ehmedê Xanî ‘eqîdeyeke menzûm nivîsandiye û bandor li nivîskarêni piştî xwe kiriye.

Mela Muhammedê Hezanî hem bi devoka Zazakî û hem bi devoka Kurmancî du ‘eqîdeyên menzûm nivîsandiye.

‘Eqîdeya ku beşê wê herî zêde ye ‘eqîda Mewlewî ye. Hejmara beşen wê 40 e.

Bi tevahî ‘eqîdeyên menzûm bi teşeya mesnevîyê hatibin nivîsandin jî lê cureyên wek qesîdeyê jî têr dîtin.

Bi tevahî ‘eqîdeyên menzûm bi tîpê ‘erebî hatibin nivîsandin ‘eqîdeyên bi tîpê latinî hatine nivîsandin jî xwuya dibin.

ÇAVKANÎ

Adak, Abdurrahman, *Helbestvanên Klasîk jî Perspektîfa Herêmî: Nimûneya Herêma Bedlîsê*, The Journal of Mesopotamian Studies, C: 1/1, Havîn 2016, r. 39

Adak, Abdurrahman, *Nêrîneke Giştî Li Ser Helbestvanên Kurdînwîs yê Herêma Şîrnexê*, Nûpelda, hejmar 9, behar, 2012, r. 29

Akçay, Ali İhsan, *Türk Edebiyatında Manzûm Akâidnâmeler: İnceleme Metin*, Doktora Tezî, Uludağ Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, İslam tarihi ve Sanatları Ana Bilim Dalı, Türk İslam Edebiyatı Bilim Dalı, 2011, r.5-6

Aydın, Ahmet, *Manzum Fikih Metinleri – I*, Usul İslâm Araştırmaları, Sayı: 26, Temmuz-Aralık 2016, ISSN 1305-2632, s.137-147

Çelik, Ahmet, *İnanç Eğitimi Açısından Mağrib'te Kadınlara Yönelik Yazılan Akide Eserleri*, Atatürk Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, h. 43, Erzurum 2015, rr. 442-446.

Çiftçi, Metin, *Eqîdenameyo Zazakî Yê Mela Mehemedê Hezanîyê*, (*Metno Transkribe kerde, Wekenitiş û Açarnayış*), Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yüksek Lisans, 2015

Çiftçi, Metin, *Edebîyatê Zazakî yê Klasîk de Eqîdenameyi*, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, Yıl:1, Cilt1, Sayı 2, Kasım 2015, r.117-119

Doskî. T.İ, 'Eqîdenameyên Kurmancî, Çapxaney Hecî Haşim, r. 19, 26, Hewlêr, 2010

Ekici, Abdullah, *Zeynelabidînê Amîdî: Jiyan Berhem û Xebatê Wî Yê Destniwîsî*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtûya Zimanê Zindî yên li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, r. 177, 2014

Ertekin, Abdulhadi, *Mela Yasîn Yusrî û 'Eqîdenameya Wî Ya Bi Navê Ed-Durru's-Semîn* (*metn-lêkolîn-ferheng*), Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtûya Zimanê Zindî yên li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, r.6, 2017

Ertekin, Mehmet Zahir, *Şêx Ehmedê Feqîr û Dîwana wî*, Arşîwa taybet. Ev behrem bi pîtê 'erebî bi nivîsa başûr hatiye nivîsandin. Wek pdf li ber deste. Lê ji ber ku bê bergê nivîskar û weşanxane ne dîyar e.

Karaca, Songül, Kadızâde *Mehmed Efendi, Manzûme-i Akâid*, (*inceleme-tenkitli metin- sözlük-dizin*), Yüksek Lisans Tezi, recep tayyip erdoğan üniversitesi sosyal bilimler enstitüsü türk dili ve edebiyatı anabilim dalı, 2012, r.3

Kılavuz, Ahmet Saim, "Akâid", DİA, cild, 2, s, 212.1989

Mehwî, *Dîwanî Mehwî*, wêşanên Nefel, r. 120-132, Stockholm, 2007

Mewlewî, -'Eqîdey Merdîyye, lêkolînewe û lêkdanewe mela 'Ebdulkerîm Muderris, pêndaçûnewe Fatih 'Ebdulkerîm, muntedî iqres-seqafî, 1988

Qoxî, Ahmet Hilmi, *Rehberê 'Ewam Şerha Nehc ul-Enam*, İhsan Yayınları, İstanbul, 2004

Sevgi, Ahmet, *Molla Câmî'nin Akâit Risalesi ve Türkçe Manzûm Bir Tercümesi*, Selçuk Üniversitesi, Edebiyat Fakültesi Dergisi, Yıl 2011, Sayı 26, s.1-4

Yıldırım, Kadri, *Ehmedê Xanî Külliyyati II*, 'eqîdeya Îmanê, Avesta, r.42, İstanbûl, 2008

Zîlan, Bilal, *Di Kitabê Muhammedê Şêx Ensarî: "Raro Raşt" û "me'lûmatê Dînîye"* (*metn û cûgîrayış*), Üniversiteye Artukluyî ya Mêrdînî Enstîtuya Ziwananê Ganîyan yê Tirkîya Şaxê Mayzanistê Ziwan û Kulturê Kurdan, Tezê Lîsansê Berzî, r. 24-25, Mêrdîn, 2016

Zivingî, Necati, *Dîwana mela 'Elî 'Ilmî-Jiyan, Berhem û Helbestêñ wî*, Banqa Heq, 2012, İstanbul, r. 33-34